Deutsches Rotes Kreuz

SUCHDIENST

Bihevgihandina malbatê

Agahiyên li ser parastina daneyan

Ger. Bihevgihandin. Yekkirin.
Xizmeta gerê ya Xaça Sora Almanî (XSA-Xizmeta gerê) piştgiriya mirovên bi sedema şerên çekdarî, wêranî, rev, koçberkirin yan penaberî ji kesên xwe cuda bûne dike. Ew alîkariyê dike daku li mirovên xwe bigerin, careke din têkiliyê bi hev re bikin û malbatan bikin yek.

Pêdiviya me bi çi daneyan bo karê me heya?
Daku piştgiriya kesekî bibe bo ku bigihîje endamên malbata xwe, , pêdiviya (XSA-Xizmeta gerê) bi gelek agahiyan li ser wî kesî heye. Ew jî daneyên wek mînak Nav, rojbûn, daneyên li ser cihê jê hatî daneyên têkiliyê yên kesên tevî hevgihandinê dibin. Di hin rewşan de jî agahiyên kesane yên taybet dikarin ji dozê re pêwîst bin, wek mînak encamên taqîkirina bavîtiyê ji bo isbatkirina endametiya malbatê yan agahiyên li ser rewşa tenduristiyê ya endamekî malbatê wek belge ji bo isbatkirina rewşeke dijwar.

Ev dane hemî daneyên kesane ne, pêdiviya me pê heye ji bo ku li gora berjewendiya kesê digere û yê lê tê gerîn bên bikaranîn.

Ji bo çi em daneyan bikartînin?
Xizmeta gerê daneyên kesane ji bo van armancan bikartîne:

1. Gera li kesên windabûyî
2. Aşkerekirina çarenûsiyan û
3. bihevgihandina malbatan.

Dane bo kesên din tên şandin?
Em daneyên kesane bi giştî gelekî bi nehênî bikartînin. Di çarçoveya karê me de dibe ku pêdivî hebe em daneyan bi cihên din re parve bikin, wek mînak

- Li nav tevna xizmeta gerê (ji Komîta Navnetewî ya Xaça Sor û Xaça Sor û Komelên Heyva Sor yên welatên din çêdibe)
- Rêvebiriyên li nav welêt (wek mînak rêvebiriya biyaniyan)
- Nûneriyên Almaniya li derve (wek mînak sefare û kunsulî)
- Saziyên alîkariyê li hindur û derve

Ev yek dikare wek mînak rê veke daku agahiyên li ser rewşa nû ya doza anîna vîsa, û weha dikare gerekbûna piştgiriya biriyara rewşa we ya tekane bike. Parvekirina daneyan bi cihên din re bi bingehîn dibe tenê ku ev yek ji bo pêkanîna karê gera me gerek be.

Heta kengî dane li ba me tomarkirî dimînin?
Daneyên hun didin me heta ku pêdiviya bikaranîna wan bo ku em bigihîjin armancên li jor hatine ziman hebe li ba me dimînin tomarkirî.

Çi rêbaz li ser bikaranîna daneyan tên meşandin?
Mafê parastina daneyan ji bo her kesê têkildar heye. XSA-Xizmeta gerê di karê xwe de, li gora rêbazên Qanûna-Parastina daneyan-Xizmeta gerê (SDDSG). dikeve tevgerê. Wekî din em bi rênîşankirinên Rêkeftinên bingehîn-Parastina daneyan (RB-PD), her weha Qanûna Parastina daneyan ya Federal (BDSG) ya bikaranîna daneyên kesane ve girêdayî ne. Eger pêdiviya karê me hebe em daneyên we bi Tevna-Xizmeta gerê re parve dikin, aliyên têkildar Rêbazên-Helwesta-Parastina-

Deutsches Rotes Kreuz

SUCHDIENST

Daneyan yên hevbeş didin ber çavan. Weha em dixwazin bigihîjin encamê ku bi kêmayî daneyên we li ba hevkarên me yên tevnê li welatên din jî bi awayekî têr bên parastin.

Çi mafên we ji bo parastina daneyên we yên kesane hene?
Mafê we heye hun bêpere agahiyan li ser hemî daneyên kesane ku me tomar kirine bistînin. Li kêleka vê yekê mafê we yê serrastkirinê heye eger me ev dane ne bi awayekî rast tomar kiribin. Eger hun tomarkirina daneyên xwe yên kesane nema bipejirîn hun dikarin bi me re parve bikin, em ê biriyara rakirina wan daneyan yan asêkirina wan bidin.
Şîroveyeke pejirandinê ku XSA-Xizmeta gerê dabe dikare herdem bi tevayî yan beşek jê bi şûnve bê kişandin.

Hun dikarin têkiliyê bi kê re deynin (cihê berpisiyar)?
Eger pirsên we ji bo bikaranîna daneyên we yan bicihkirina mafê we yê bidestxistina agahiyan, serrastkirin, rakirin yan asêkirin, bişûndekişandinê hebin hun dikarin berê xwe bidin cihê XSA-Xizmeta gerê ya ku we ji bo gera li kesekî têkilî pê re danibû.

Muhr yan nav, navnîşan û nemra têlêfonê ya cihê kar

Eger hun kesekî têkildar nas nekin, hun dikarin berê xwe bidin cihê kargêriya XSA-Xizmeta gerê:

Deutsches Rotes Kreuz
-Generalsekretariat-
Team 22/Suchdienst-Leitstelle
Carstennstraße 58
12205 Berlin
Tel.: 030 / 8 54 04 -170
Fax: 030 / 8 54 04 -458
E-Mail: suchdienst@drk.de

Her weha Nûnera me ya parastina daneyan-xizmeta gerê jî Frauke Weber wek keseke têkildar amade ye, hun dikarin bi riya E-Mail: frauke.weber@drk.de têkiliyê deynin.